

HUN MAFÊN XWE

DIZANÎN?
BIKAR TÎNÎN



This project is funded by
the European Union.
Bu proje Avrupa Birliđi tarafından
finanse edilmektedir.



HAKLARA DESTEK
İnsan Hakları Örgütlerini
Destekleme Programı



1986
İNSAN HAKLARI DERNEĐİ
DIYARBAKIR ŞUBESİ

Ev belavok bi piştgiriya Yekîtiya Evropayê ya çandeya Tirkîye hatiye amade kirin.
Şaxa Amedê ya Komeleya Mafên Mirovan, bi temamî berpirsyarê naveroka vê belavokê
ye û ev ne nêrînên Yekîtiya Evropayê ya çandeya Tirkîye ye.

TU BI MAFÊN XWE
TU BI MAFÊN XWE
DIZANÎ?
BIKAR TÎNÎ?



dîroka çapkirinê
REŞEMÎ 2021



HEKE HÛN KETIBIN BINÇAV!
HEKE BIXWAZIN LÊGERÎNA MALA WE BIKIN!
HEKE BIXWAZIN LÊGERÎNA SER WE BIKIN!
HEKE HÛN BI ÎXLALA MAFÎ RE DÛÇAR BIN!

**tu dızanî ku
tu yê çî bikî?**



POLÊS AN JÎ CENDIRME DI KÎJAN REWŞAN DE DIKARE WE BIDE SEKINANDIN?

Polês piştî nişana belgeya polîsiya xwe; kesan û seyareyan ji bo bergirtina sûtçî ji bo girtina kesên sûtçî kirine ji bo diyarkirina nasnameya kesên sûtçîdar, ji bo diyarkirina kesan ku di der heqê wî/ê de girtin an jî anîna bi zorê hebe û ji bo parastina jiyana kesan û hebûna malên wan dikare bisekinîne. Ji bo ku polês rayeya xwe ya sekinandinê bikar bîne bi tecrûbeya pişeya xwe û di rewşa heyî de divê sedemeke wî/ê ya hişwer hebe. Bi awayekî domdar, bi rewşa rasteqînê ya piyaseyê û bi awayekî keyfî nikare bide sekinandin.

POLÊS AN JÎ CENDIRME DI KÎJAN REWŞAN DE DIKARE NASNAMEYA WE BIXWAZE?

Polês, piştî nişandana belgeya xwe ya polîsiyê, divê sedema kesî/ê ku daye sekinandin diyar dibe û ji ber sedema ku hatiye sekinandin dikare pirsan bipirse; ji wî/ê kesî/ê dikare nasname an jî belgeyên hewceye ku li ser be bixwaze.

DI KÎJAN REWŞAN DE DIKARIN SER WE Û SEYAREYA WE LÊGERÎN BIKIN?

Kesên ku dixwaze li ser we lêgerîn bike nasnameya wî/ê bixwazin. Destûra lêgerîna li ser laş bixwazin. Vê destûra lêgerînê bi nivîskî ye. Lê belê ji bilî kontrola bi dest û ji der ve li ser wî/ê kesî/ê û amûrên wî/ê û dema ku mirov ji der ve li seyareyê mêze bike cihê ku nahên xuya kirin divê bi esasên ku ji hêla wezaretê hundirîn de bînin diyarkirin re kesên ku bi nivîsa fermandarê bazbendê ku ji hêla fermandarê mulkî, di rewşên lezgînî de piştî teyîtkirina nivîsê bi fermana devkî ji tê kirin. Biryara fermandarê bazbend di nava bist û çar seatan de pêşkêşî pejirandina dadgêr dibe. Vê biryara lêgerînê heya ji pejirandina dadgêr derbas nebe tu daraza wê nahê qebûlkirin. Ji ber vê yekê teqez lêkolîna lêgerîna di der heqê we de gelo di pejirandina dadgêr de derbas bûye nebûye mêze bikin. Li hember pejirandina dadgêr mafê xwe yê neqebûlkirinê bi kar bînin.

DÎ KÎJAN REWŞAN DE DIKARÎN MALA WE, KARGEHA WE Û CIHÊN WE YÊN GIRTÎ LÊGERÎN BIKÎN?

Ji bo ku bikaribin mala we, kargeha we û cihên we yên girtî lêgerîn bikin divê sûcdariya we bi heyîya gumaneke hişwer bê nîşandan an jî ji bo girtina gumandarek sûcdar, piştrastbûna sûc bikeve dest lêgerîn tê kirin

- Kesên ku dixwazin lêgerînê bikin nasnameya wan bixwazin.
- Biryara lêgerînê bipirsin. (Biryara lêgerînê, mîna belgeyek nivîskî ji hêla dadgêr ve tê dayîn. Di vê belgeyê de cihê ku ew ê lêgerîn lê bibe yê we ye yan na, seata lêgerînê diyar e yan na, di biryarê de navê we heye yan na, sedema lêgerînê diyar kirinê yan na û li mêjûyê belgeyê mêze bikin. Di biryara lêgerîneke minasîp de hemû van tiştan divê hebin, ji bîr nekin.)
- Di rewşeke derengbûnê de fikare hebe ji hêla dozgerê komarê an jî fermandarê bazbend dikare destûra lêgerînê bide. Lê belê di vê belgeyê de jî navê we heye tune ye teqez kontrol bikin û li mêjûya belgeyê mêze bikin. (Heke ku di destûra lêgerînê de esehî, mêjû û seat nehatibe diyarkirin dibe belgeyek li dijî hiqûqê. Di vê rewşê de mafê we yê ku hûn dikarin mala xwe nedin lêgerînê heye. Ji bilî ev tişt heke biryara lêgerînê li gorî hiqûqê be jî di encama lêgerînê de hûn dikarin girtenameyê destnîşan nekin an jî hûn dikarin sûreteke girtenameyê ji wan bixwazin. Mecbûrin ku mînamekê bidin we.)
- Mîna rêbaz bi şev ne li mala we, ne li kargeha we ne jî cihên we yên girtî nikarin lêgerînê bikin. Lê belê di rewşên li ser sûc û di derengbûnê de fikare hebe dikarin bi şev jî lêgerînê bikin.
- Di dema lêgerînê de dozgerê komarê ku ne amade be, ji şandeya ixtiyaran an jî cîranan du (2) kes divê li wir amade bin.

DEMA HÛN KETIN BIŊAV Û DEMA KU HÛN DI BIŊAV DE BIN MAFÊN WE ÇI NE?

- Ji kes an jî kesên ku dixwazin we bikin biŊav, pirsra hûn kî ne û nasnameya wan bixwazin.
- Sedema ku we dixwazin têkin biŊav bipirsin. BiŊavkirin tenê şertên ku zagonan diyar kiribe pêk hatibin tê kirin.
- Sedema biŊavkirina we di wê kêliyê de hewceye ji we re bibêjin. (kesê ku hatiye girtin, dilê wî û revê hebe, heke ku ihtimala zerarê bide xwe û yên dora xwe hebe kelemçe li dest dikeve. Ji bilî ev tişt bi tu awayî kelemçe li dest nakeve. Heke li gorî keyfa xwe kelemçeyê li dest bixin, teqez di derheqê wan kesan de danezana sûc bikin.
- Dema ku hûn hatin girtin, biŊavkirin an jî dema biŊavkirina we dirêj kirin, demildest divê agahî bidin merivek we.

ŞEKLÊ AMADEKIRINA RAPORA TENDURÎSTIYÊ Û DI VÊ MIJARÊ DE MAFÊN WE ÇI NE?

- Beriya biŊavkirinê hewceye hûn di kontrola bijîşk re derbas bibin. Li jûreya bijîşk mafê te yê ku tu bi bijîşk re tenê bimînî heye. Heke ku we dît bijîşk ji heqê muayeneyê dernakeve, hûn dikarin nojdariya wî/ê qebûl nekin û bijîşkek din bixwazin. Beriya ku ew ê we ji biŊav derxin jî dîsa ew ê we bibin bal bijîşk. Heke nerhetiyeye we hebe an jî miameleyek nebaş re dûçar mabin, qet şerm nekin û netirsin ji bijîşkê xwe re bibêjin û ji bo ku bike raporê li ser bisekinin. (Ev rapor di demên pêş de ew ê bibe piştrasteke girîng.) Kesên ku hatibe girtin an jî hatibe biŊavkirin, ji ber sedemek cih guhertina wî/ê, dirêjbûna biŊavkirina wî/ê, serbest berdan û beriya kirariyên edlî ji rewşa wî/ê bi rapora tenduristiyê divê bê izbat kirin. Kesê ku di biŊav de ye dikare sûreteke rapora bijîşk ji wan bixwaze.

Di dema muayeneyê de mafê we yê ku hûn parezerê xwe bixwazin heye.

Muayeneya bi kelemçeyê teqez qebûl nekin. Bijîşkê ku we bi awayekî kelemçeyî muayene bike ew jî peywira xwe bi nebaşî bikar tîne û berpirsiyar e, jî bîr nekin.

MAFÊ DENGNEKIRINÊ ÇI YE? MAFÊ DENGNEKIRINÊ BÎ BERFIREHÎ ÇI YE?

Kêliya ku hûn ketin binçav şûnde bazbend, hewceye mafên we bîne bîra we. Mafê we yê dengnekirinê heye. Mafê dengnekirinê; jî bilî agahiyên nasnameyê di der heqê mijarê de tu tişt negotîne. Ji bîr nekin ku nikarin bi zor hin tiştan li dij we bi we bidin gotin. Mafê dengnekirinê di heman demê de di teşxîsa binçavkirinê de an jî di hemû kirariyên di cih nîşandanê de jî di hewîne. Çawa di cih nîşandan û dema kirariyên teşxîsê de mafê te yê dengnekirinê hebe mafê te yê parêzer xwestinê jî heye.

HÛN DÎ KÎJA REWŞÊ DE DİKARIN PARÊZER BIXWAZIN?

Kêliya ku hûn ketin binçav şûnde hûn dikarin parêzer bixwazin. Sûc çî dibe bila bibe heke hêza we ya aboriyê tune be jî ji Baroyê bi awayekî bêheq hûn dikarin parêzer bixwazin. Ji bo ev tişt xwesteka xwe ya parêzer di binçav de ji peywirdarê bazbend re bêjin bes e. Hûn dikarin bi parêzerê xwe re rû bi rû dîsa hûn dikarin parêzerê xwe bixwazin ji bo têkeve ifadedayina we.

DEMA HÛN DÎ BINÇAV DE BÎN MAFÊN WE YÊN DÎN ÇI NE?

Hînkirina sûcê li ser me û mafê me yê xwestina berhevkirina piştrastên baş heye. Wekî din kêliya ku hûn hatin girtin şûnde belgeyên ku dixwazin bi we bidin destnîşankirin teqez bixwînin. Belgeyên agahiyê dijî vîna we destnîşan nekin û mafê we yê sedema destnenîşankirinê binivîsin jî heye. (Mafê ji destnîşanê xwedûrdan)

DEMA JI BINÇAV BÊ DERXISTIN

- An rasterast hûn ê serbest bîn berdan (Di vê rewşê de girtenameya ber-

danê dê bê amadekirin, hûn dikarin mînameke girtenameyê bigrin.)

- An hûnê derkevin bal dozger, di dema li bal dozger jî mafê we yê dengnekirinê û parêzer xwestinê heye. Di vê rewşê de dozger dikare îfadeyê we bigre û we berde an jî dikare girtina we bixwaze û we bişîne bal Dadgêriya Ceza ya Sulhî. Dema di binçav de heke hûn bi miameleyek nebaş re dûçar mabin, teqez jî parêzerê xwe re û jî dozgerê xwe re bibêjin.
- Heke bi xwestina dozger hûn derketibin Dadgeriya Sulhî, dadgêrê sulhî piştî îfadeya ya dê we berde ya jî dê we bigre. (Heke miameleyek nebaş hebe jî dadgêr re jî bibêjin.) Dema hûn li dadgêriya jêpîrsînê hatin girtin şûnde li hember vê biryarê di nava heft (7) rojan de mafê we yê neqebûl-kirinê heye. Dema di binçav de girtin 24 seat e. Binçavkirina kesên bi biryara Dozgeriya Komarê pêk tê. Binçavkirin, ev bergirî jî hêla lêpîrsînê de mecbûriye û gumana ku yekî sucek kiribe girêdayê heyiyan piştrastên şênber nîşandan e. Bi awayê di rewşên li ser sûc girtin de bimîne; di derheqê şexs de sûcên ku jî hêla zagonan ve hatine diyarkirin, bi diyarkirina farmandarê mulkî re jî hêla fermanarê bazbend ve heta bîst û çar seatan, di demên bûyerên civakî de bûyerên tundî zêde bibin û bi awayekî ciddî sazûmana gelemperî xira bibe û sûcên ku bi komî bèn kirin de heta çil û heşt seatan jî dikarin bikin binçav. Sedema binçavkirina jî holê rabe û kirarê temam bibin an jî di encama ew demên ku li jor diyarkirîna de di derheqê kirariyan de agahî dê bidin dozgerê komarê û li gor talîmata wî tev tê gerandin. Şexs herî dereng çil û heşt seat, di sûcên komî de di nava çar rojan de divê derbixin hemberî dadgêr. Di derheqê kesên ku li dijî ev daraz derdikeve de hûn dikarin giliyên xwe bikin û doza cirmê li wan vekin.
- Sisê û jî sisêyan zêdetir şexs heke bi şîrîkî bi sûcekî awayek komî werin sûcdarkirin, dozger jî bo berhevkirina piştrastiyan û jî ber sûcdariya komî û tiştên mîna vana dikare çar rojên din jî binçavkirina wan bi fermana nivîskî dirêj bike. Di rewşeke wisa de, kesên ku hatiye girtin, parêzer an jî nûnerên zagonî, hevjiina wî/ê an jî merivên wî/ê yên pîleya yekem an

jî duyem, ji bo ku demildest bê berdand dikare li dadgêriya cezaya sulhê îtîraza xwe bike. Heke dema binçavkirina we dirêj bibe, divê demildest agahiyê bidin merivên we.

Di madeya derbasdara ku li Zagona Têkoşîna Terorê zêde kirine ya di navbera 25/07/2018 û 24/07/2021'an de hatiye destpêkirin de lêpîrsînê ku hatine destpêkirin û kirariyên binçavkirinê heke ji 3'an hindiktir bin dema binçavkirinê 48 seat e lê ev dem ji hêla dozgerê komarê ve 2 car dikare were dirêjkirin. Heke sisê û ji sisêyan zêdetir kes bi hev re werin binçavkirin dema binçavkirina wan 4 roj e. Dîsa bi xwestina dozgerê komarê û bi biryara dadgêriya cezaya sulhê dikarin 2 carên din ji dirêj bikin. *Yanî bi kurtasî heya 24/07/2021'ê li gor zagona têkoşîna terorê heke kesên ku bên girtin ji sisêyan hindiktir bin herî zêde 6 roj dê di binçav de dê bimînin. Heke ji sisêyan zêdetir bin herî zêde dê 12 roj di bin çav de bimînin.*

Dema hûn hatin binçavkirin, heke parêzerê we tunebe û abaoriya we jî ji bo parêzergirtinê têr neke 7 roj 24 seat mafê we yê ku hûn parêzer ji Baroyê bixwazin heye. Parêzerê ku Baro ji we re bişîne bêheq e. Ji bo vê yekê dema binçavkirinê de tenê ji bazbendê peywirdar xwesteka parêzer bikin.

Ji bîr nekin!!! Dema hûn hatin binçavkirin an jî hûn di binçav de bin hûn bi miameleya nebaş re dûçar mabin, mafên we yên di derheqê perpirsiyaran de gilîbûn heye.

Ji bîr nekin!!! Heke hûn bi awayekî ayîl hatibin binçavkirin, heke we di dema zagonî de dernexin hember dadgêr, heke agahiya binçavkirina we nedabin merivên we, heke li gorî zagonan hûn werin binçavkirin an jî werin girtin şûnde di derheqê we de bêtaqîbat were dayîn an jî hûn bê sûc derkevin, heke biryara lêgerîna di heqê we de bi awayekî bêpîvan were meşandin, heke dema hûn hatin binçavkirin ew tiştên ku dest dane serê nedin we, hûn dikarin ji bo hemû zeraên xwe yên berçav neberçav hûn dikarin doza cirmê li dewletê vekin. Pêvajoya edlî ya ku we derbas kir şûnde heke hûn bêstûc

derketibin û hewceyê teqîbatê nekiribe û ev biryar ji we re hat eşkerekirin şûnde di nava 3 mehan de serî li dadgeriya nobedar a sûtên giran ku hûn li wê dijîn bidin.

SAZIYÊN KU HÊZA GELEMPERÎ DI DESTÊN WAN DE YE DI ENCAMA KIRARIYÊ AN JÎ ÇALAKIYEK DE JI BO KU ZERARA WE JI RASTÊ BÊ HILANÎN HÛN DI-KARIN ÇI BIKIN?

Rêveberiya ku hêza gelemperî di destê xwe de dihewîne kirariyek, çalakiyek an jî di encama îxlalek de heke zerara we ya berçav û neberçav çêbûbe ji bo ku vê zerarê ji rastê bê hilanîn ji dîroka zerarê heya salek jî tu dikarî serî li saziya eleqedar bidî. Heke rêveberî vê serîlêdana we red bike, bêbersiv bihêle an jî hinek zerara we tenê ji rastê hilîne û bersiva rêveberiyê ji we re were şûnde di hundirê 60 rojan de hûn dikarin dozê vekin. Ji bo ku zerara we ji holê rabe serîlêdana ku we kiriyê ji hêla rêveberiyê ve heke bêbersiv mabe piştî 60 rojê hûn dikarin di hundirê 60 rojê din de doza cirmê vekin.

HEKE HÛN BI ÎŞKENCEYÊ Û MIAMELEYA NEBAŞ RE DÛÇAR BIMÎNIN DIVÊ HÛN ÇI BIKIN?

Îşkence sêcek mirovahiyê ye, bêdeng nemînin!!! Îşkence û zordestaneyên din dijî mirovahiyane an jî miameleya biçûker an jî li hember,

Ceza Peymana Koma Gelan Made 1: Li gorî armanca peymanê, têgeha “îşkenceyê”, kesek an jî kesên seyemîn, vî kesî an jî xebitîna kesên sêyemîn an jî bi xebitîna wî gumandar sedemeke kiriyarek, ji bo bi destxistina armanca cezakirinê agahî an jî îtiraf an jî peywardarek gelemperî yê ku cudatîyê dike an jî bi teşwîqa kesê ku bi vî awayê tev digere an jî bi daxwaza xwe an jî peymanê pêkanîna fîzîkî an jî êşa giran a manewî an jî tê wateya fêla jan-dayîne.

Peymana Mafên Mirova ya Ewropayê Made 3: Qedexeya îşkenceyê; tu

kes bi îşkenceyên, dijî mirovahiyê an jî cezayê rûmetşikandinê an jî bi van kiryanan rû bi rû divê nemîne.


Zagonê Cezayî yê Tirk Îşkence Made 94- (I) Li hember kesek li dijî rûmeta mirovan û laşî an jî di hêla rûhî de êşkişandin, têgihîştin an jî bi bandorbûna qabiliyeta vînê, peywirdarê gelemperiyê ku pêkanîna tevgerên bûçikbûyîne bi cih tîne di derheqê wî de ji sê salan heya dozdeh salan hikmê cezayî heye.

Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan Made 5- Divê bi tu kesî îşkence nehê kirin, zordestane, dijî mirovahiyê an jî bi tevgerên rûmetşikandinê re rû bi rû nehêlin û ceza nedin. Îşkence, miameleya nebaş û miameleya dijî mirovahiyê an jî ku hûn bi tevgerê rûmetşikandinê re dûçar bimînin ji bo van tevgera û ji bo bidawîbûna ceza û ji bo cezakarîna faîlan hûn dikarin serî li Saziya Mafên Mirovan bidin. Li kuçe, di binçav de îşkence û miameleya nebaş re hûn dûçar mabin; agahiyên xwe yên di vê mijarê de teqez hûr bi hûr ji parêzerê xwe re vebêjin. Wekî din dema ku hûn hatin binçavkirin û ji binçav hatin derxistin û birin bal dozger an jî dadgêr ji hêla bijîşkek ve teqez hûn ê bên muayenekirin. We çî îşkence an jî miameleyên nebaş dîtibe teqez ji bijîşk re vebêjin û bikin mîna rapor û raporê ji kontrol bikin. Heke bijîşk we muayene neke an jî tam muayene neke, giliyên we li girtenameyê neni-vîse, hûn dikarin bijîşk red bikin. Heke ku hûn derketin hember dozger an jî dadgêr hemû îşkence û miameleyên nebaş ji wan re jî vebêjin. Ji bîr nekin îfadeyên ku di bin îşkence û miameleya nebaş de hatibe girtin li dij we nikarin bikar bînin. Heke hûn mexdûrê îşkenceyê bin hûn dikarin serî li Weqfa Mafên Mirovan a Tirkîyê bidin (TIHV).

Îşkence û Miameleyên Nebaş ên Herî Zêde ku Tê Bikananîn Ev in:

Heqaret, bi dar lêxistin, şîrqam, çavgirtin û sekinandin, gefên kuştinê, bi tirsandina ku ew ê bi merivên we îşkence bikin, biçûkxistin, li erdê sekinandin, bi devkî û fizîkî tacîz, dimenên îşkencê û dengê wî guhdarkirin, marş û

mûzîka biteqereq guhdarkirin, înfaza bi vira, astengkirina mîz û gû, feleqe, pîncê dûz –çarmix, pîncê Filîstîn, ji pê pîncê berovacî, li erdê carmix, ceyran dayîn, tî û birçî hiştin, ava şîd, di hûcreyê de tecrîd, gun li hev badandin, li erda cemidî sekinandin; por, rih û simbêl kişandin; bi zor por, rih û simbêl jêkirin, di nava pîsaiyê de sekinandin, xwê xwarin, teklîfa sîxuriyê, li bal merivên wan an jî li bal kesên din îşkence kirin, tazîkirin, lîdîwarxistin, bi torbeyê qûmê lêxistin, bi domdarî tenê li cihêk laşxistin, li erdê dirêjkirin û derketina ser û giranî danîna ser, gaza îsotê, tecawiz, tûkirina dev, mîzkirina ser, zordayîna aktîvîteya fizîkî, şewitandin, çixare tefandin, dirêjkirina li ser qeşayê, nehiştina razandinê, bi demên dirêj di heman pozîsyonê de sekinandin, xwarina tiştên nezan, li ber paceya vekirî bêhewa hiştin, zordayîna xwes-



tekên bêwate, bi kelemçeyê sekinandin, îşkenceya teker, di avê de fetisandin, mudaxileya bijîşkî, îşkenceya tabûtgehî, lêgerîna qunê, lêgerîna quz.

MÎNA JIN HÛN MAFÊN XWE DIZANIN?

Li Gorî Peymana Stanbolê Tundiya li Ser Jinê

Tundiya Li Ser Jinê ;

Yek bênpêkirina mafên mirovan û mîna cihêkariya li hember jinan tê fêmkirin. Dixwazî di qada gelemperî de, dixwazî di qada taybet de bila bê holê; li hember jinan, fizîkî, zayendî, rûhî an jî zerara aborî an jî kesê ku ezab daye û ew ê bide bi zayendiya civakê re eleqedar her çalakî û bi van çalakiya gef bixwe, zorandin an jî tê wateya bi awayekî keyfî ji azadiyê bêpar hiştin.

Tundiya di Nav Malê de;

Di nav malbatê de an jî di malê de an jî mexdûr û kesê ku tundiyê dike di malek de bijîn an jî nejin jî hevşînên kevn an jî nû an jî di navbera hevjinan de mîna fizîkî, zayendî, rûhî an jî tê wateya çalakiya tundiya aborî. Tundî û talûkeya pratîka tundiyê hebe her kes dikare vê rewşê giliyê cihê fermî an jî cihê eleqedar bike. Peywirdarê gelemperî yên ku gilî ji wan re hatiye di wergeriya zagonî de divê peywira xwe bînin cih û tevdîrên ku ew ê bi pêk werin re eleqedar divê rayedara agahdar bikin.

Dema Hûn bi Tundiyê Dûçar Man Tiştên ku Hûn ê Bikin

Kesê ku tundiyê li ser we dike heke bi we re di heman malê de diji mîna hevjin, bav, zarok û hezkiriyê we, li gor Hejmara 6284 Zagona Derheqê Parastina Malbatê;

Heke tundî li ser we hebe serî li herî qereqola nêz, dozgeriyê an jî dadgêriya malbatê bidin û mafê we yê ku hûn ew kes ji malê dîr bixin, heya dûrahiyek nêzê malê nekin, ji bo ku li kargehê nerihetiyê nede we, heke çek li ser wî

hebe jê were stendin, ji bo ku bi navgînên ragihandinê nerihetiyê nede we û hin tiştên ku di zagonê de diyar kirîne hûn dikarin bixwazin.

Tiştên ku we li bazbendiyê gotiyê bi hemû hûrgiliyê wî ve li girtenameyê-divê hûn bidin nivîsîn. Girtenameya ku ji hêla bazbendiyê ve hatiye amadekirin we xwend şûnde tê de kêmasî an jî îfadeyek xelet hebe sererastkirina wî bixwazin. Kesê ku tundiyê li we dike ku hûn wî qet nas nakin di îfadeyên xwe de teqez şeklê wî diyar bikin.

Heke hûn bi tundiya fizîkî û zayendî ducar mabin hê dewsa tundiyê di laşê we de hebe biçin saziya tenduristiyê ya herî nêz an jî serî li nexweşxaneyê bidin û tundiyê bikin rapor. Ji bo raporê cihê ku hûn çûnê heke nexweşxane be demildest giliyên xwe ji polêsên nexweşxaneyê re vebêjin.

Ji ber giliya sedema ku hûn bi tundiyê re ducar mane û heke we serî li qereqol an jî cendirmeyê dabe, ji saziya eleqedar teqez rapora muayeneya edlî ya di derheqê xwe de bixwazin.

Ji bo biryara tevdîra parêzger bide, di mijara pêkanîna tundiyê de pistras an jî dokument ne hewce ye. Biryara tevdîra bergir, divê dereng nekeve û bê girtin. Dayîna vê biryarê, qasî ku armanca zagonê têxe talûkê divê dereng nemîne. Heke hêza we ya aborî tune be kesê ku li we tundiyê dike li gor zagona hejmara 6284'an serîlêdana ku ji bo sedema tevdîra parêzger ya dadgêriya malbatê mafê we yê ku hûn nefeqeyê bixwazin jî heye.

Kesê ku tundiyê dike di heman demê de debara malê an jî alikariyê jî bike li gor hikmê Zagona Şarwerî ya bi hejmara 4721'ê heke hikmê nefeqeyê nedabe jî bijîşkê malbatê jiyana ku hatiye mexdûrkirin li ber çav digre nexwaze jî dibe ku hikma nefeqeya tevdîr were dayîn.

Li hember kesê ku tundiyê li ser we dike tîrsa we ya can û mal hebe û heke hûn ji ewlehiya canê xwe ditirsin, bi rêya serokdozgeriya komarê hûn ê bên parastin û hûn jî xwesteka xwe ya Mala Sitare ya Jinan bikin. Kesê ku tun-

diyê dike û biryara tevdirê dabin ser û dîsa jî pêk nahêne û aciz dike an jî bixwaze tundiyê bike serî li serokdozgeriya komarê bidin. Di vê rewşê de li dij biryarê tevgerandin û di derheqê kesê ku tundiyê pêk tînin de heya 6 mehyan biryara hefsa zorandin tê dayin.

Li Gerîndeyê Tapoyê şerha “xaniyê malbatê ye” daxwaz bikin. Di pêvajoya zewaca we de heke hûn nexwazin yek alî xaniyê we were firotan, hûn mafên xwe yê tapoyê yên ku hûn girêdayê wan in zanin? Bi tabloya malbata xwe biçin gerîndeya 15 û bi xaniyê xwe ve eleqedar şerha “xaniyê malbatê ye” ji Gerîndeyê Tapoyê bixwazin. Şerha xaniyê malbatê ku li ser nekêşbar hebe, mêr an jî jin bê desnişana hevjinê xwe nikare xanî bifiroşe û dewr bike.

Ji Tacîz û Tecawizan re Bêdeng Nemîne, Serlêdan Bike!

Îstîsmara zayendî, destdirêjkirina zayendî an jî hûn bi tecawîzê re dûçar mabin, hê piştrastên ser we hunda nebûbin biçin qereqola herî nêz û gilî bikin. Hê piştrast hunda nebûne gihastandina cihên edlî, kesên ku êrişên zayendî, tacîz û bi tecawîzê tê sûcdarkirin ji bo ku ceza bigre pir girîng e.

Heke Hûn bi Mobbingê Dûçar Mabin ;

Kesên ku di kargehan de dixebitin (bi taybetî jin) ji hêla xwediyê kar û yê mîna xwediyê kar ve bi tundiya zayendî, peyvî, rûhî an jî fizîkî re bi mobbingê dûçar bimînin, derheqê kesên ku mobbingê pêk tîne de mafên we yên hiqûqî heye. Li gorî fiqreya TCK ya 105/2. “hiyerarşî îstîsmara zayendî an jî ji ber têkiliyên xizmetê nifûz nebaş hatibe bikaranîn an jî ji fêydeya xebata hêsanbûna kargehê ku hêz girtibe, nivê cezayê ku bê dayîn zêdetir ceza digire. Ji ber vê yekê kesên mexdûr dev ji karê xwe berda be, cezayên ku bê dayîn di binê salek de nîn e.”



This project is funded by
the European Union.

Bu proje Avrupa Birliđi tarafından
finanse edilmektedir



HAKLARA DESTEK

İnsan Hakları Örgütlerini
Destekleme Programı



1986

İNSAN HAKLARI DERNEĐ
DIYARBAKIR ŞUBESİ

MIROV

BI MAFÊN XWE MIROVE



Kuçeya 1. ya Elî Emîrî Aprt. Yılmaz 2004 No: 1/3 Bajarê Nû / AMED

☎ 0412. 223 30 33 - 229 58 66 ☎ 0412. 223 57 37

✉ diyarbakir@ihd.org.tr 🌐 www.ihddiyarbakir.org

🐦 @amedihd